Newroz Hejmar(64) Rûpel (9) Çirya pêşîn 2005z – 2617k

pêşangeha Durist li Şamê

Şêx Birîmce

Di 5/10/2005 an de, li Şamê li meydana **Şehbende**r, nêzîkî seroktiya rûnişтgeha şalyaran, li katjimêr11an, bi seden ji kurd û Ereban dixwastin bi rengekî şaristanî û aştî katjimêrekê li hev kom bibin. Dengê xwe li dijî şovîntî û rêzaniya ku rêjîma Sûryê, ji çil û sê salan ve li dijî miletê Kurd bikar aniye – hîn jî berdewame- wê rêzaniyê şermezar û riswa bikin.

Lê rêjîma Sûryê, li şûna ku ``di van rojên teng de`` serê xwe hinekî nerm bike, gotinên serokkomarê xwe berêz **Beşar el Esed** yê ku berî salekê soz da bû, ku vê babetê çareser bike, nasnama Sûrî li wan vegerîne, biryarên konfirasa partiya xwe ya Be`is bi cih bîne- ya ko tekane xwe xwediyê Sûryê dibîne- tev bi darê zorê ji katjimêr yazdan çarîkek kêm ve, dest bi belavkirina beşdarên ku dihatin li mêydana civînê bicivin, taromar dikirin, nedihiştin du-sê mirov li ba hev bicivin durişmên hatine nivîsandin bilind bikin.

li dawiyê, bi darê zorê xelk ji meydana Şehbender û derdora wê pereng-perengî kirin, û hat gotin: Hin ji leşkerên paristina rêjîmê bi dar û lepan li hin beşdaran dan û birêz **Mistefa Cim`e** endamê seroktiya **partiya Azadiya Kurdî** tilûyekî wî şikandin.

Bi vê reng danistandina hovane, rêjîm nikare royê bi bêjingê veşêre, vê doza ku ji çil û sê salan ve ji berçavê miletê Sûryê hatî veşartin veşartî bihêle, çareseriyek dadmend, jê re nebîne .Hêjayî gotinê ye ku: Ev cimawer tev li ser daxwaza û vexwendina **komîta hevxistina nişтimanî ya ji bo pişтgirtina azadiyatîyên bingehîn û mafên mirovan li Sûryê** (Hevxistin/tensîq) ya ko di 2/10/2005 an de, daxwuynek li ser riya Enternêtê belavkirbû kombûn.

Hemî hêzin Kurd û Ereb yên ku bi rengekî aştî û sivîl dixwazin guhartinê di Sûryê de bi cih bînin, ev komît avakirine. Bêtirî 20 partî, komeleyên mafên mirovan, komîtên vejîna civaka sivîl li Sûryê tê de cih girtine, yanê hemî rêxistin û saziyên Kurd û Ereb tê de kardikin..

Dora 300 hezar Kurd ji hermafî bê par in û ta nasname ji wan hatî standin, zarokên wan li ba rêjîmê nayên nivisandin, nikarin bê erêkirina rêjîmê polekî jî bixwînin û ger xwendin û bawername standin, nikarin pê karbikin, piraniya wan di xwaringeh û razangehan de kardikin, lê bê rêdana polîsan ew nikarin li wir razin.

Yê bê nasname herdim nikare di nexweşxanên gişтî de, xwe dermanke....Malekê, firoşgeh, erebekê ji xwe re bikire, an li ser xwe dapike. EW tim cihê pirsînê ye, ger deh zarokên (wî an wê) hebin di kertên sor de xuya ye ku hînî êrgane jin ji xwe re naniye .Yanê bi kurtî ew ji her mafekî bê pare.

sexbirimce@yahoo.com

Şam 6/10/2005